التاريخية بالنظام الإيراني؛ فمنذ أن وعد رئيس وزراء الشاه رضا خان، "قوّام السلطنة"، وهو الرجل الذي ساهم في الإجهاز على التجربة الكردية، قاضي محمّد، بالاستجابة للمطالب القومية الكردية وتوسيع رقعة جمهورية كردستان لتتجاوز مساحة مهاباد، والجانب الكردي متشكّك بوعود السلطة وجدّيتها في معالجة القضية الكردية؛ فقد اغتالت طهران قياداتٍ عشائرية وسياسية على اختلاف توجهاتها، ويأتي تلميح الرئيس الإيراني مسعود بزيشكيان بتوسيع صلاحيات المحافظات خلال فترة الحرب كإغراء باهت إن لم نقل إن أوانه قد فات بالنسبة للكرد.

هناك جانب آخر ملحوظ في خضم المخاوف الكردية من المضي في التصعيد العسكري وهو وجود انقسام اجتماعي/سياسي يتمثّل بأدوار "الجاش" الكرد (المتعاونون مع النظام الإيراني)، وهم إلى جانب المناقبية والحيثية الاجتماعية والسياسية والمنافع المالية التي حازوها، لم يقرّروا الانضمام إلى الجهود الكردية القومية الداعية إلى الانشقاق عن النظام، ولعل عملية الانشقاق هي إحدى المؤشّرات الحيوية عن قرب دنوّ أجل النظام، على ما حصل في العراق عام ١٩٩١.

في الغالب، تخلّت واشنطن عن تصوّراتها لإنهاء الحرب بطريقة الزحف البرّي، فالحرب وفق الخط البياني لها لن تكون برية أو بحاجة لتداخل جراحي عسكري على الأرض، سواء كان تدخّلاً مباشراً أم عبر الحلفاء. وهنا تتناقص أهمية الاعتماد على الأحزاب الكردستانية المؤتلفة في شباط/فبراير الماضي، خاصة وأن تلك الأحزاب طالبت بسلسلة ضمانات من بينها تأمين غطاء جوّي وتزويدها بالأسلحة الثقيلة والمدرّبين وفتح أفق التعاون مع واشنطن ليصبح سياسياً ولا يقتصر على الدعم العسكري واللوجستي. بهذا المعنى، لم تعد كردستان الأرض الأثيرة التي يمكن أن تبدأ منها عملية إسقاط النظام الإيراني، وهو ما لم تعد تفضله القوى الكردستانية أيضاً لخشيتها من جملة نتائج كارثية من بينها أنها ستصبح وفق هذا الشكل "عدوّاً داخلياً" متعاوناً مع الخارج ويعمل بدلالته القومية وبدون غطاء وطني معارض، وكل ذلك في ظل عداء إقليمي لفكرة إعادة تشكيل النظام السياسي الإيراني على أسس فيدرالية.

المصدر: المركز الكردي للدراسات

Şano li herêma Efrînê.... Ji bîranînên Merwan Berekat

Sal: 1981
Mijar: Şano.

Cih: Gundê Soxanekê, çiyayê Lêlûn herêma Efrînê.
Li gundê me daweta Osmanê Sêwî bû. Berî dawetê bi deh rojan, min ji hin heval û dostên xwe xwest ku em li rojeke dawetê şanoyekê pêşkêş bikin. Ji min pirsîn: Mijar û naverok dê li ser çi be?
Min ji wan re got: Bila mijar li ser rola Axan a neyînî û zordariya wan di civakê de be.
Me li hev kir û dest bi amadekariyê kir. Li roja dawetê ya dudiyê li danê piştî nîvro, dema ku hemû şêniyê gundê me û yê gundên derdora wî li dawetê beşdar bûn, me li qada govendê dest bi pêşkêşkirina şanoya xwe kir. Min rola Axa biribû, bi kum û du çekan bûm wek ku di wêneyan de diyar e.
Şano bêhtirî demjimêrekê dirêj kir. Hemû şêniyê dawetê biçûk û mezin kêfxweş bûn û ji me xwestin ku li roja sisiyê jî şanoya xwe pêşkêşî bikin.
Mixabin hînga kamîreya ku vîdyo werbigirtana li ba me tune bû. Tenê kamîreya wergirtina wêneyan hebû. Hemû wêneyên wê şanoyê li ba min hebûn. Lê mixabin di encama koçkirina sêcarkî de hemû windabûn, tenê du jê mane.
Kesayetên di wêneyan de:
- Merwanê Berekêt.
- Ehmedê Mecîd (Meco).
- Betalê Xelîlê Hemûdê.
- Hemûdê Mihemedê Xelo. (Rehma Xwedê lê be).

==========

Li sala 1982an, li daweta Hisênê Mixtêr me şanoyeke din pêşkêş kir. Naveroka wê li ser qedexekirina axaftina zimanê Kurdî di dibistanên Sûriyê de bû. Ango dema ku şagirt di dibistana gundên Kurdan de bi zimanê Kurdî dipeyivîn û çawa mamoste ew siza dikirin. Di wê şanoyê de, rola min a momoste bû.

Nivîskar û Helbestvan: Merwan Berekat

Diyarî ji bo xwendevanan

Pêşverû

TÊKOŞERO

Karwanê xebata me birêve bibe
bila dibistana te û nemiran
avakirî roj bi roj ronî bibe
Qermoçên eniya te ne pîrbûne
Na belê dîroka pêncî sala ye
xwêdana li ser wan hêviyên
cotkar û pala ye
Bila cîhan ji zindanan bipirse
dê bêjin çendî ji temenên we
ji xweşiyên we dixwarin
Çendî roj û şevên we tevlihev
dikirin
Têkoşero
Bila cîhan ji sîtemê bipirse
dê bêje çendî baskên xwe li we
dialand
Cendî ji jîna we dinoşand
Careke dî bila jê bipirse
Cîhan dizane ku sîtem ji we
ditirse
Têkoşero
Bila cîhan ji çol û beyaran
bipirse
Dê bêjin çendî
We û wan û şevên sar
hevdu himêz dikirin
çendî şîv û taştiya we dibû mirin
Têkoşero
Hînbûne em di dibistanê de
Tu caran li pey leylanan nabezin
Ne siwarên xewna ne em
Hêviyan ji milet nadizin
Di deryayên bê gemî de
Ciwanên xwe nakujin

Ev helbest min li ser Têkoşer û xebatkarê hêja Mamoste Hemîd Derwîş nivîsî bû bi boneya yobîla "zêrîn ya PDPKS di sala 2007an de

Bîranîna Rewşenbîrê kurd yê Navdar `Wezîrê Eşo`

Nivîskar, wêjezan, dîrokzan, rojnamevan-pûblîsîst û wergêrê kurd yê bi nav û deng Wezîrê Eşoyê Hûtî Begê 1ê mijdara sala 1934an li payîtextê Gurcistanê-Tivlîsê hatiye dinê. Xwendin-perwerda xwe ya destpêkê di dibistana gundê xwe – Pampê (niha Sîpan li herêma Ermenîstanê ya Aragasotinê) û ya Tivlîsê ya jimara 23an da bi giranî bi zimanê ermenî bi cî aniye. Sala 1958a fakûltêta (beşa) Zanîngeha payîtextê Ermenîstanê – Yêrêvanê ya dîrokê xilas kiriye. Salên 1958-1961ê weke serokê dibistana gundê xwe – Pampê (li nawça Axbaranê) kar kiriye. Salên 1961-1963an li Lênîngiradê (niha Pêtêrsbûrg) beşa kurdzaniyê da ya Înstîtûta Rojhilatzaniyê, bûye pisporê dîroka Kurdistanê. Salên 1964-1994a wek rêdaktor, serrastkir û kontrolkirekî çapemeniya Ermenîstanê yê sereke, her usa jî wek rêdaktor-wergêrê beşa weşanên bi kurdî ya Radiyoya Ermenîstanê li Yêrêvanê kar û barên xwe bi cî anîne. sala 1995 çû Belçîkayê û di 23 çile sala 2015a li Payîtextê Bêlcîka-Brûksêlê çû ber dilovaniya Xwedê.

Wek nivîskar berhemên wî di rojnameya kurdî ya Riya Teze da û her wiha bi wergerên ser ermenî û rûsî di rojname û kovarên Ermenîstanê yên wêjeyî da ji sala 1958a û vir da hatine çapkirinê. Berhemên wî yên lîtêratûra bedewî weşanên kurdî yên bi radiyoyê jî xemilandine. Novêl û wergerên Wezîrê Eşo yên lîtêratûra bedewî, bi tayîbetî bîranînên wî ser Erebê Şemo di berevokên berhemên nivîskarên kurd da jî hatine çapkirinê, ku salê carekê bi sernavên « Bahara teze » û « Bahar » li Yêrêvanê salên 80î û 90î hatine weşandinê.

Hetanî niha ev pirtûkên Wezîrê Eşo yên berhemên lîtêratûra bedewî, zaniyariyê û wergeriyê hatine çapkirinê : « Mizgînî » (Yêrêvan, 1976); « Xebera dosta » (berevoka novêlên nivîskarên ermenî bi pêşgotin û wergera ser kurdî); « Dengbêj kal bibû » (Yêrêvan, 1983); « Xaçatûr Abovyan, Kurd, Êzdî » werger, pêşgotin, pênasîn û pêradanok yên Wezîrê Eşo (Yêrêvan, 1986) ; « Pamp-Sîpan » (Yêrêvan, 1986) ; « Dosya Barzanî sandoqa Stalîn ya polayî da » (bi kurdî, Hewlêr, 2007, bi wergera ser erebî : Hewlêr, 2008) ; « Pariyê berdemayî » (Hewlêr, 2008) ; « Kurdzanê mezin Qanatê Kurdo » (Bilxaristan, 2010) ; Zargotinzanê kurd yê mezin » (bi ermenî, Yêrêvan, 2010), ev pirtûk ser jiyan, kar û barê Heciyê Cindî hatiye nivîsandinê; « Simoyê Şemo: jîyan û kar » (bi kurdî, Yêrêvan, 2013); « Pirtûkên Kurdî li Ser Kurdan - Li Ermenîstanê » (bi kurdî, Brûksêl 2016); « Sîber » (bi kurdî, Diyarbekir, 2016); « Qirme » (bi kurdî, Diyarbekir, 2016); « Tosinê Ûşan » (bi kurdî, Diyarbekir, 2016); « Îtbarî » (bi kurdî, Diyarbekir, 2016); « Hosta Hovannes » (bi kurdî, Diyarbekir, 2016).

14 pirtûkên nivîskar û zaniyarên kurd û ermenî bi pêşgotinên Wezîrê Eşo hatine weşandinê, ku her yek ji wana wek xebat, lêgerîneke zanyarî tê dîtinê. Bilî wan gelek gotar û raporên wî yên bi tayîbetî ser pirsên kurdzaniyê û ser kurdzanan, ser dîrok, wêje û çanda Kurdên Yekîtiya Sovyêtiyê û Ermenîstanê bi şiklê lêkolînên zaniyarî di berevok, rojname û kovarên Ermenîstanê, Rûsyayê, welatê Awropayê û Herêma Kurdistanê ya fêdêral da bi kurdî, ermenî, rûsî, almanî hatine çapkirin. Çend heb ji wana raporên zaniyarî ne, bi kîjanan Wezîrê Eşo beşdarî konfêransên zaniyarî li eyînî welatan bûye.

Weke rojnamevan-pûblîsîst Wezîrê Eşo ji nîveka salên 50î yên sedsala buhurî û vir da deng daye. Bi sedan gotarên wî di rojname û kovarên Yekîtiya Sovyêtiyê ya berê, welatên Awropayê û Kurdistanê da hatine weşandin, di malperên kurdî da hatine belavkirin, bi giranî yên ser dîrok û jiyana Kurdên Sovyêtistanê ya çandî. Em îdî derheqa wan komêntar, şirove û nivîsên wî da nabêjin yên ku bi radiyoya Yêrêvanê bi zimanê kurdî, lê usa jî ermenî û rûsî, hatine weşandin.

Wezîrê Eşo bi sedan sêmînarên ser dîroka Kurdistanê, bi tayîbetî tevgera azadîxweziya kurd, ser wêje û çanda kurdî, ser kurdzanînê li Ermenistanê û piştra li welatên Awropayê, nemaze Bêlcîka û li Herêma Kurdistanê bi cî anîne. Pirtûkên çend nivîskar û zaniyarên kurd, di nava wê jimarê da yên fêrên ziman û lîtêratûra kurdî bi **rêdaktorî, bi** serrastkirina Wezîrê Eşo hatine weşandin.

Wezîrê Eşo warê wergervaniyê da jî xizmeta pêşxistina wêjeya kurdî û xwendevanên wê kiriye. Ewî gelek berhemên nivîskarên ermenî yên kilasîk û hemdem yên dûznivîsarê (pirosayê) bi giranî yên ser jiyana kurdî û qehremanên kurd bi wergerên xwe kirine mal û milkê xwendevanên kurd. Bi wergera wî her wisa jî kurteromana nivîskarê rûs yê mezin Arkadî Gayîdar ya bi sernavê « Têmûr û koma wî » beşa pirtûka fêran ya « Zimanê kurdî » ya kirêstomatîk da ya bona sinifa 4a hatiye bi cîkirinê.

Wezîrê Eşo xizmeta şanogeriya kurdî jî kiriye. Di radyoya Yêrêvanê da ew pir salan şîretkarê derhênan bûye di warê amadekirina şanoyên radiyoyê (radiokompozîsiyan) da yên ser bingeha berhemên nivîskarên kurd û ermenî çêkirî. Du şanoyên radiyoyê jî ser bingeha serhatiyên (novêlên) wî bi xwe yên bi sernavên « Tîgran û Mehmûd » û « Koçekê derewîn » hatine amadekirinê **(çêkirinê).** Lê komêdiya Wezîrê Eşo ya bi sernavê « Remo, Şemo, Temo û lawik » çend salan ser sehna (dika) Têatiroya Elegezê ya kurdî ya gelêrî bi serkeftin hatiye nîşandanê.

Niha ev pirtûkên Wezîrê Eşo li ber çapêne û ji bona weşandinê tên amadekirinê : « Wêjeya kurdî li Ermenîstanê », « Stranbêjê kurd yê mezin Şivan Perwer », « Dîrokzanê kurd yê bi nav û deng Şekroyê Mihoyî », « Doxtirê kurd yê lêgêndî Şîraliyê Eşo», « Kurteroman », « Hûnera kurdî ya stranê û mûzîkayê û qeyîdkirina berhemên wê li Ermenîstanê » û yên dinê.

Wezîrê Eşo di dawiya jiyana xwe da bi giranî ser lêkolîneke berfireh karê xwe berdewam dikir ya ser kar û barê Barzaniyê Nemir li Yekîtiya Sovyêtiyê ya berê salên 1947-1958a.

Reşnivîsarên bîranînên Wezîrê Eşo, novêl û kurteromanên wî yên nû û çapnekirî têra dagirtina çend pirtûkên stûr dikin.Wek nivîskar û wergêr Wezîrê Eşo yekemîn **ronakbîrê** kurde li Ermenîstanê û dervayî sînorên wê, ku hêjayî xelata Yekîtiya nivîskarên wê komarê ya bi navê Erebê Şemo (Şamilov) bûye. Ew hatiye hilbijartin weke endamê Yekîtiya nivîskar û Yekîtiya rojnamevanên Ermenîstanê û Yekîtiya Sovyêtiyê. Ji ber kar û barê xwe yê civakî yê aktîf, bi heyacan ew hatiye hilbijartin wek cîgirê serokê Şêwra Ronakbîrên Kurd li Ermenîstanê.

Piştî hatina li Awropayê Wezîrê Eşo kar û barê xwe yê berhemdariyê û civakî berdewam dikir wek endamê Instîtûya Kurdî ya Brûkselê, lê piştra bû endamê Bûroya Kurdî ya Pêwendî û Agahdariyê li eyînî bajarî. Ew her wisa jî hatibû hilbijartinê weke serokê şerefê yê rêxistina Kurdên Kavkaziyayê li Bêlcîka.

Dûmahî : Dr.Ebdilmecît Şêxo : Rola Kovara (Hêviya Welêt) (1963-1965)Z. xelek: 3

Xeleka dawiyê ye

xwedan û eger di destên xwedanmaf de dar û çek tune be,yanê ew rêya mirinê ye **û em** tucarî jî Kurdistanê nabînin .
(Dibêjin wefdeke Kurdî Li ser zînat û sitemkariya Ecem
Nivîsareke dûr û dirêj Li parîsê daye sekretêrê (Heyata Umem) Çêla biserhatiya Kurdên ci-wanrû
Ku hinde jê hatine kuştin .. Ma kînga heq têtedayîn ..Ho?
Heke xwedî heq ne dest bi dar be
Qelsî reya mirin û wenda bûnê
Bê şer û gelş û qîrên û lêdan Lingê me naçe nav axa Kur-distan
Ho .. xortê Kurdê hêja Rabe bi merdî serî hilde Di nava gelên cîhanê de Tu tenê ma ye bê nav û nîşan û deng..

…….

Osman Sebrî di helbesta (Ho xort) de bi dengê bilind bang li xortên Kurdan dike û erkên welatperwerî li **ser milên** wan jî dibîne,lê ne tenê wisa,ew dixwaze ji xortên Kurdan re rasterast bêje:Hûn pêşengên gelê xwe ne û hêviya Kurdistanê bi we bilind e,ku hûn serkêşiya doza gelê xwe bi dilêrî ji bo serbestiyê bikin,lê peyrewî bi ramanên biyaniyan,gelê Kurd dê her-dem bindest û kole bimîne û divê armanca miletê me yek be û rêzan û ramana me jî ji bo pêkanîna mafên netewî yek be.
Ho xortê Kurd Pêşengê xebat Hêviya welêt
Ji bo azadî
Bi ramanên xelkê
Li ser reya wan
Dê bibin bindest
Çavên xwe veke
Wek her carê
Neyî xapandin.
M.Bor di çîroka xwe (Diz û lawik) ya ku di Buharê de der-baz bûye wisa dibêje:Nîvî şevê derbaz bûye,lê tariyê rind perdên xwe li ser bajêr de berdabûn, çavan çav ne-didît,tenê car li caran ji dûr ve dengê dîkekî,an jî qijîna pîpka payerên kolanan dihat-in,lê xûşîna baranê jî çiqas xweş bû,eger helbestvanek li wê derê hebûya,ewî kanîbûya derbarê zulmetê de helbestek binivîsiya.Lê bûyerên vê çîrokê li Diyarbe-kirê (Amedê)derbaz dibin,diz dikarî di şevê de dîkanekê talan bike,lê di sibê de; divê ew biçe mizgeftê û Mela ji mizgeftê derdikeve û diçe ba jineke bi mêr,ev Diyarbekir bû,ew tijî çîrok û efsane bû.Kalemirovek hebû ,bi wî re digotin Apo,ew dizekî jêhatî bû,Memo zarokek bû,lê ew bûbû dostê apo,herduyan dizê dikirin,lê apo ew berdida hundir dîkanan taku ew diziyê bike,lê ew bi dizîbûna wî ne qayil e, ji ber ku ew biçûk e û nikane pir tiştan ji hundiran derxîne,apo girs û por spî bû,tariyê dîsan dorhêl vegirt û ji bo dizan fersendek baş bû,lê kalê me sud ji dizîyê nedîtibû,ewî dixwast bixebite,lê tukesî ew li nik xwe neda xebtandinê, ev kalemêra dîsan diziyê dike û li dawiya dawiyê ew li kolana Amedê têtе kuştin.
Bi rastî;M. Bor vê çîrokê pir baş li tevnê dixîne, di vir de carna nêrînên hevdij,carna nêrîn û helwestên erênî têtin holê,di navbera kalemêrê me û civakê de hevkêşeyên ne dirust peyda dibûn, xûya ye; ne tenê mirov gola civakê diherîmîne,lê carna jî civak jî nizane mirovê xwe perwerde bike û çavên xwe li ser kêmkasî û şaşiyên borî damrîne û rûpeleke nûh ji serastkirinan re veke .
Wek di dîroka tevgera gelê Kurd di Rojavayê Kurdistanê de baş diyar e ku Dr.N.Zaza Siyasetmedarekî jêhatî û nav-dar bû,ew sekretêrê (Partî Dêmokrata Kurdistanê) li Ro-javayê Kurdistanê bû,ewî jî mîna pir hevalên xwe di zîndanên dewleta Bas de pir lêdan û êş dîtibû,lewra ew direve
Libnanê,li vir Dr.N.Zaza serpêhatiyeke xwe di bin navnîşana (Şerê Mê-şa) dirêse;Dr.N.Zaza (15) rojan jiyana xwe li mala Kurdekî belengaz derbaz dike,ew li wir demên xwe bi kuştina mêşan derbaz dike û ew li wir ji ber mêşan û girînên zarokan gelek bêhteng dibe,ew mêşên ku nedihêştin.

Dr.N.Zaza raze,mîna en-damên partiya Bes li pêş wî dihatin xûyakirin.
Li dawiyê em kanin bi sanahî bêjin ku ev hersê hejmarên nirxbuha di bin navnîşana (Hêviya Welêt de) bi pênûsên gelek siyaset-medar û wêjevanên Kurdi-stanî roleke berçav di pêşket-ina tevgera rojnamegeriya Kurdî de lîstiye.

Xeleka dawiyê ye

Dr.Ebdilmecît Şêxo : Rola Kovara (Hêviya Welêt) (1963-1965)Z. xelek: 3

Di hejmara sêhem de em tenê kanin sê gotaran bixwînin;1-(Şoreşa Kurd û daxwaza awtonomî bo Kurdistana nîvro (Îrqa),Soro,2-(Kurdistan û serxwebûn3-Kronolojiya nivîskarên Kurd li Kurdistana Bakur) Hemreş Reşo.
Herwisa jî di vir de (9)helbest hatine weşandin;1-(Rojî reşî şeşî Eylû) Kemal Fuad,2-(helbestek bê navnîşan)Hejar,3-(Sewaş ji Xwedê re. 4-Xwrok.5 -Axa welat) Hemreş Reşo. 6-(Meşa Xorta Kurda,7-Newroz,8 -Hoşiya min) M.Bor. 9-(Ho xorto) Osman Sebrî.
Lê tenê di vir de serpêhatiyek di bin navnîşana (şerê mêşa de) bi pênûsa Dr.N.Zaza cihê xwe girtiye,herweha jî dîsan çîrokek di bin navnîşana (Diz û lawik) de bi pênûsa M.Bor de li tevnê ketiye.
Soro di gotara xwe (Şoreşa Kurd û daxwaza awtonomî bo Kurdistana nîvro de) li ser hin pirsgirêkan bi hurgilî radiweste;ew bi van wateyan dibêje:Ev bûye nêzîkî sê salan ku miletê me li dijî hukumeta xwînmij û keleş li Îraqê berevaniya xwe dike,bi hezaran ew bûne pakrewanê Kurdistanê û bi sedan gund hatine wêrankirin,lê pêşmergên qehreman bi pîdarî li hember karbidestên Îraqê radiwestin,lê gava partiya(Bes) bûye destlatdar,ewê soz dabû gelê Kurd ku daxwaza gel (awtonomî bo Kurdistanê û dêmoqratî bo Îraqê) bi cihûnin, mixabin li dewsa mafdayînê,ewê di Pûşpera,sala1963 an de êrişek dirinde û hovane bire ser Kurdistanê,lê Kurdan digotin:(Kurdistan yan neman!),lê piştî Selam hate ser textê Îraqê,carek din şer rawestiya û danûstandin di navbera Kurdan û hukumetê de dest pê kir,di encamê de çareserî ji kêşeya Kurdî re nehate kirin,şer sernûve dest pê kir,li dawiyê Soro gelek bi azadiya Kurd û Kurdistanê bawermend bû, ew nameyek ne rasterast ji destlatdara Besiyan re dişîne û dibêje:
(hukumet bi destên xwe gora xwe dikole).Em di vir de kanin bêjin ku Soro di nivîsîna xwe de pir serkeftî bû,ewî bi hemû awayî tovên geşbînê di dilên xwendekarên Kurdistanê de li dervayî welêt diçandin.
Lê sernivîserê kovarê Hemreş Reşo di gotara xwe (Kurdistan û serxwebûn de) li ser rewabûna damezrandina dewleta Kurdistanê serbixwe dipeyive û ew dibêje:Di sedsalên me de nema kes bi galgalan,baweriyên bê zanistî û tarî înan bike û têkoşînê ji ber wê da bike,lê ev sedsala dema rastî û şiyarbûna gelan e.Gotarnivîs mercên gelbûnê bi xwendevanên xwe dide nasîn û dibêje:Di vî sedsalê me de,divê bi tenê ew gelê ku di welatekî de dijî,bi dîrokek kevin bi hev ve hatibin girêdan,ew kesên wî gelî bi dilsozî bixwazin bi hev re bijîn û pêşve biçin,gava ev mercên jorî di gelekî de hate dîtin,ew wek gelekî tête naskirin û gava dewlemendiya welêt jî têrî wan kir,serxwebûn dibe mafê wan.Hemreş Reşo hîn dibêje:Emê karibin gelên din bawerkirin bidin ku nema gelê Kurdistanê bê serxwebûn û girtina mafên xwe dikare bêdeng bisekine û destên xwe li ber neyar û gelên din mîna parsokan verge,ji ber ku hemû mercên gel û netewayetiyê cem Kurdan hene, bi hezaran xort û keçên me di şoreşên Agirî,Dêrsim û niha jî sê salên li Kurdistanê xwîn tête rijandin.Herweha Hemreş

Reşo dewlemendiya Kurdistanê bi herdu çemên navdar (Dicle û Feratê)jî di ber çavên xwendevanên xwe re derbaz dike,lewra ew serxwebûna Kurdistanê mafekî rewa dibîne û bi vî awayî; nivîskar çirek geş di hişên xwendkarên Kurd de li Ewropa vêdixe,lê ne tenê wisa,H.Reşo di vir de gelek helbestvanên Kurdistanê yên ku rolên xwe di pêşketina wêje û hestên netaweyetî de lîstine bi xwendekarên Kurd li Ewropa dide nasîn û ji wan ev in:1-Melayê Cizîrî.2-Elî Herîrî.3-Feqiyê Teyran .4-Melayê Batî .5-Şerefedîn Bitlîsî.6-Ehmedê Xanî û hin din .
Em tenê dixwazin li vir du malikên pir navdar yên helbestvan Hejar mîna zengileke dengdar di guhên xwendevanan de dikin hawar û qêrîn,ew dixwaze bi Kurdî bijî û bi Kurdî jî bimre û bi Kurdî jî here gorna xwe
(…..
Bi Kurdî ejîm,bi Kurdî emrim
Bi Kurdî edem weramî qebrim .
…).
Lê Osman Sebrî di helbesta (Wefda Kurdî) de û ya bi (144) malikên niştimanperwerî û şoreşgerî hatine ristin û bi dengê bilind û zelal bang li gelê xwe dike û dibêje:Divê hûn li mafên xwe bibin xwedan û **eger di**

Rûpel 14

Dûmahî : Ehmed Silêman: “Tu rê li ber me nînin ji bilî yekîtî û Rêkeftinê”

*nûnerên hemû pêkhateyên siyasî û çandî û civakî yên Kurdî amede bûn. Herwiha hin aliyên Kurdistanî ji Tirkiyê û Iraqê jî li vê konferansî amede bûn. Her usa nûnerê hêzên Emerîkî li herêmê amede bûn û şandeke Kurdî ya hevbeş hate sazkirin da ku danûstandinan bi Şamê re bike di derbarê belgeya ku di konfirans de hatiye çespandin. Mixabin ji encama sedemên cihêreng, encamên konfirans hatin rawestandin. Ji aliyekî ve hikûmeta demkî tevî daxwazên berdewam lê pêşwaziya vê şandeyê nekir û herwiha rakêşana Hêzên Sûriyeya Demoqrat ber bi feqa diyaloga tekane bi behaneya ku ya girîng ew e ku bicihanîna rêkeftinê di derbarê mijarên **leşkerî û** ewlehî de, herwiha di bin fişara Emerîkiyan de. Sêyem bikarîna Encûmena Niştimanî ya Kurdî bû, dema ku ew bi şêweyekî tekane çûn Şamê û hevdîtin bi Serok Elşer' re kirin û wisa rewş bi pêşket da ku hikûmeta Şamê fersend ji vê rewşê dît û bi şêweyekî tekane danûstandin bi herdu aliyan re kirin li ser hesabê helwesta Kurdî ya yekbûyî. Mixabin piştre ew hevdîtin di çarçoveya hin kursî û mijarên rêveberî de hatine bi cîkirin û li ser hesabê mafên netewî yên gelê Kurd.*

*Mixabin hilbijartinên encûmena gel nîşandan ku Kurdan di parastina yekîtiya wan de binketî ne, û mixabin careke din wek rêkeftinên Hewlêr û Dihokê ev rêkeftina jî hate rawestandin. Sedema girîng ew e ku mîkanizmên avakirina vê rêkeftinê li ser şêweyê hevpariya fîftî fîftî bû û piraniya hêzên Kurdî piştguh kirin. Bêguman nebûna biryara Kurdî ya Sûrî ya serbixwe, ew yek, ji sedemên têkçûna vê rêkeftinê bû, lê partiya me bi hin hêzên Kurdî yên din re pabend in bi belgeyên vî konfiransî û çalakirina şandeya Kurdî ya hevbeş. Ji ber ku ew desteya yekem e ya nûnertiya Kurdan li Sûriyê dike û ya herî pêkan û guncaw ev şandeya Kurdî ya **hevbeş e.***

Li Tirkiyê pêvajoyek heye, ku dewleta Tirkiyê jê ra dibêje“pevajoya Tirkiyeyê bê teror”, aliyên PKK ji dibejin“pevajoya aşitî û demokrati.” Her usa tê zanin, ku RevaberiyaXweseri li Rojava Kurdistanê di bin qontrola PKK de bû. Bandora pêvajoya hanê a li ser Kurdistana Rojavayê çawadinirxinin?

Bê guman Tirkiyê bi rolekî girîng dilîze di rêvebirina mijarên Sûriyê de û di hemû astan de. Herdem ew li dijî berjewendiyên Kurd di Sûriyê de dilîst û bi şêweyekî rasterast hebûna Partiya Yekîtî ya Demoqrat dikir behane û herwiha serkirdeyên leşkerî di HSDê de yê ku Tirkiyê wê weke beşek ji Partiya Karkerên Kurdistan dibîne da ku nehêle tu destkeftiyeke Kurdî Sûrî were meydanê. Ez bawer im ku PYDê ji aliyê xwe de nikarîbû baweriyê bi civaka navdewletî re bike di nehiştina vê peywendiyê bi PKKê re. Lê belê di rastiyê de ew behane ye, bo nimûne helwesta niha ji Kurdistana Iraqê û yê ku Tirkiyê wê weke şaşiyek mezin dibîne û lê temaşe nake di çarçewa çareserkirinek niştimanî Iraqî ji doza gelekî û beşekî girîng ji gelê Iraqî ye. Û ji vir de pirosêsa aştiyane ya berdewam li Tirkiyê bi şêweyekî rasterast ew bandorê li ser rewşa Kurdistana Sûriyê dike û her ku pirosês bi pêş bikeve wê encamên wê yên erênî li ser herêmê peyda bike. Lê belê ev nikare bibe gavek ber bi çareser kirina doza Kurdî li Sûriyê û ji vir de hikûmeta demkî li Sûriyê û nikarîbûna wê li ser derbaskirina fişarên herêmî û navdewletî û vegerandina biryara xwe ya nştîmanî ya ku berjewendiyên Sûriyan destnîşan dikin. Ji bilî wê ev faktur dimîne demkî û ne guncaw, herwiha Tirkiyê nahêle ku Kurdên Sûriyê bighên mafên xwe eger zêdetirî asta mafên Kurdên Tirkiyê bin. Ev ji aliyê xwe de pêwistiya wê bi çareseriyeke niştimanî Sûrî heye dûrî ejendeyên derve û zor mixabin ev merc jî niha tune ye.

Di wan demên dawiyê da gelek bahs li ser hevhalwestiya hemû parti û aliyên Kurdî tê kirinê. Bîr û baweriya we li ser vêmijarê çi ye? Gelo di zirufa îro de Kurd dikarin KongreyêNeteweyiya Kurdistanê pêkbinin?

Erê ev daxwaza li hemû ciyan hemû Kurdan kom dike û ji encama hevkariya hêzên herêmî û navdewletî di pirojeyên xwe de li herêmê û yên ku metirsiyê li ser Kurdan li her çar parçeyên Kurdistanê peyda dike, bi taybetî li bûyerên ku li Kurdistana Sûriyê rûdane û gengeşe li ser dûbarekirina sînaryoyê li Kurdistana Iraqê bi behaneya tevlêkirina çekê di bin serkirdayetiya saziyên leşkerî de. Yên ku tê wateya ku girûpên serberdayî li Iraqê û yên ku hin alî li ser kar dikin ku hêzên Pêşmerge jî li xwe bigre. Herwiha Kurdistana Îranê jî di çavên bahozê de ye û şerê di navbera Emerîka û Israyîlê de. Îranê gefan li gelê Kurd dike û herwiha bi paşxistina pirosêsa aştiyê li Tirkiyê û ya hikûmeta Tirkiyê ya niha weke encamên veguhastinan li Rojhilata Navîn û ne di baweriya hikûmetê de ye, ku doza Kurd î li Tirkiyê çareser bike. Di siya vê rewşê de danûstandin û hemahengiya di navbera aliyên Kurdî û Kurdistanî de girîngiyek dîrokî ye û pêwîst e û divê hemahengî û yekrêzî li her parçeyekî cuda were avakirin piştre li ser asta Kurdistanî. Lê mixabin di rastiyê de rewş dûrî vê yekê ye, ji ber ku rewşa nakokî û parçebûnê di navbera aliyan de li her parçeyekî Kurdistanê bi hevsengiya van nakokiyan dihêlin ku rê xweşkirinê peyda bike, ku rê li ber ber pirojeyên ku Kurdan di herêmê de armanc dikin nemînin. Bi baweriya min ev mijara jî îro gelekî zehmet e.

Ji îro pêva Kudên rojava divê çi bikin? Bernama we ji bona duwerojê çi ye?

Kurdan li Sûriyê derfeteke dîrokî zirar kirin ji çareseriyeke guncaw û pêkan ji doza xwe re û gelek kaxezên hêzê yên di dest wan de winda kirin, ji encama kedên deh hezaran ji pakrewan û birîndaran û herwiha koçberî û êş û azarên ku dîtine di qeyrana Sûrî de, ji 2011an de û heya bi vê dîrokê. Tevî vê yekê rêya herî guncaw û pêkan dimîne di yekîtiya alî û helwestê de, ji vir de pabendbûna bi konfiransê 26 Nîsanê û şandeya Kurdî ya hevbeş dimîne bingeha karê Kurdî li Sûriyê û îro divê danûstandin li ser bingeha Kurd bi hikûmetê re be. Ji bilî wê ku çi be wê helwesta Kurdî lawaz bike û wê li ser hesabê mafên gelê Kurd yên netewî û dadmend bin û encama hin ji kursiyên karmendiyê ne zêde dike û ne sûdê dike.

Gotina we yên dawî çi ne?

Tevî ku rewşa Kurdî ji ber parçebûnê digazîne û gef û metirsiyekê li ser hebûna netewî ya Kurdî û mafên wan peyda dike, lê tu rê li ber me nînin ji bilî yekîtî û rêkeftinê û ji vir de serkirdayetiya aliyên Kurdî û Kurdistanî û di destpêka wê de ji aliyên sereke tê xwestin nakokî û berjewendiyên xwe yên teng derbas bikin û li berjewendiyên gelê Kurd binêrin û girîngiya gihaştina zemînekê ji bo lidarxistina kongireyekî netewî ya Kurdistanî ji hemahengî û hevkarî û bawerî kirina cîran û hevparan û civaka navdewletî ku Kurd beşek in ji çareseriyê, ne, beşek in ji pirsgirêkê û çareser kirina pirsgirêka wan tê wateya aştî û aramiyê herwiha Kurd hevparên rastî ne di peyda kirina aştî li herêmê û cîhanê.

Ehmed Silêman: “Tu rê li ber me nînin ji bilî yekîtî û Rêkeftinê”

Ehmed Silêman: “Tu rê li ber me nînin ji bilî yekîtî û rêkeftinê”

Bandora rewşa aloj û tevlihevê Rojhılata Navin û şerê Amerika-İsrail ligel Îranê lı ser Suriyê û Kurdistana Başûrêrojavayê gelek e û gelê me di vê beşê welatê de helû mercekê gelek dijwar da xebat dike.

Ji bona, ku pirtir ji rewşa Kurdistana Başurêrojava agadar bin, me ligel Cîgirê Sekreterê Giştî a Partiya Pêşverû (PDPK-S) Ehmed Silêmanê hevpeyvin çêkir.

Redaksiyona DENG

Bi giştî rewşa Kurdistana Rojava ya îroyinî çawa ye?

Bi şêweyekî tevahî rewş li Kurdistana Sûriyê ne aram e û bi taybetî piştî bûyerên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê li Helebê ku çêbûn û tiştên ku bi xwe re peyda kirin, herifandina rewşa leşkerî û herwiha rêveberî û gihaştina hêzên rêjîma Sûrî derdora bajarê Hesekê ye. Piştre gefên herêmê ber bi şerekî navxweyî metirsîdar di navbera Kurd û ereban de çû, yê ku bi rêya rêkeftina 29 heyva Çileya borî ew gef hatin rawestandin. Lê belê rêkeftina ku di bin heyam û rewşeke dijwar de hatibû îmzekirin nikarîbû daxwazên herêmê û Kurd an di peydakirina çareseriyeke siyasî û aramiya pêwîst peyda bike.

2- Dizanin Amerîka û İsraîl êrîşê Îranê, Îran jî êrîşa bingehên serbaziyên Amerîka li navçeyê û İsrailê dike. Bandora pevçunên hanê li ser Sûriyê û Kurdistan Rojava çi ye?

Şerê ku çêbûye bandora xwe li herêmê bi tevahî kir û herwiha tirsek mezin li cem hemû Sûriyan peyda kir, Herêma Kurdistana Sûriyê û hin herêmên din li Sûriyê tûşî armanc kirina ji aliyê rokêtan ve hat û wan rokêtan hin baregehên Emerîkî jî kirin armanc. Lê ne bi wî şêweyê mezin ku dewletên din li herêmê dîtine û tirs ew bû ku ev pevçûn bighê Iraq û Libnanê. Tirs ji wê yekê bû ku Sûriyê di vê pevçûnê de were têwer kirin, lê rawestandina şer ev pêşhatên metirsîdar sivik kirin. Lê di vê dawiyê de û bi taybetî li ser asta pêşketina bûyeran li Libnanê û tekeziya Îranê li ser yekîtiya meydanan, metirsiyeke rastîn bû ku Sûriyê jî têvedin nav vê rewşên li Libnan û Iraqê ji aliyê alîgirên rêjîma Îranî ve. Daxuyaniyên Tiramp di vê derbarê de û axavtina wî ku dibêje alîkariya Sûriyê ji wan re, li Libnanê nîşana metirsiya vê pevçûnê bû li ser Sûriyê û herwiha li ser Kurdistana Sûriyê jî, ji ber ku ew li ser sînor e bi Iraqê re.

3-Bîr û baweriya te li ser Hikûmeta Katî a Sûriyê ango deshilata Colanî çi ye? Gelo dikare pirsên Sûriyê çareser bike?

Mixabin û bi rêya derbasbûna zêdetirî ji 19 heyvan di ser hebûna wê di deselatê de, nikarî bû dozên siyasî yên sereke di Sûriyê de çareser bike. Ew rijd bû li ser tekaliya desteya rizgariya Şamê bi mofirkên sereke di deselatê de. Pêkhateyên sereke ji beşdarbûna di deselatê de bi dûrxistin û gavên ku hatine avêtin dûrbûna di navbera wê û welatiyan de hîn kûrtir kir. Tevî ku derfetên mezin li hember wê ji aliyê hêzên nûnertiya civaka Sûrî dikin li ser vê hikûmetê, lê belê rewş heya bi niha tu nîşanê nade ku ew ber bi gavên rastîn ve diçe di çarçewa çareserkirina dozên ku rûberiya welêt dikin ji aliyê siyasî û aborî û ewlehî ve. Usa xuya ye, ku Amerîka û İsraîl dixwazin bi rêka cigirkirina Pêymana İbrahîmî ve, li Rojhilata Navîn sistemeka nu ava bikin, ku bi qazanca wan be. Gelo desthilata Colanî beşekê vê sistemê ye? Bir û baweriya we li ser hewla Amerîka û İsraîl çi ye?

Xuya ye ku ji girîngtirîn erk li hember vê hikûmetê gihaştina rêkeftinekê bi Israyîlê re ye û tevî fişarên Emerîkî û Israyîlî xuya ne di vê mijarê de. Lê belê rewş ew e ku ev hikûmeta karînên wê yên rastîn nînin ku bigihên vê rêkeftinê û ew ji raya giştî li Sûriyê bi tirs e yê ku bi dehê salan jiyan kir bi nakokî vê nerînê. Lê belê ez bawer nakim ku Emerîka û Israyîl û heya bi hin dewletên kendavê fişarê bikin di gihaştina van rêkeftinan de, tevî ku bûyerên Heftê Oktoberê di navbera Hemas û Israyîlê de helwest zehmetir kir. Niha mijar berdewam e li ser derbaskirina astengiyên ku nahêlin ew bighên serî. Di destpêka wê de Îran û ji vir de xuya ye ku mijar bi girêk û nakok e bêtirî ji çareseriyeke nêz ve û bi vî awayî mijara rêkeftinên İbrahîmî jî di dema niha de hatine bi paşxistin.

Îmza kirina Pêymana Qamişlo û hewla Serokatiya Kurdistana Başûr bona bi dest xistina mafên netewî yên Kurdên Rojava, ji aliyê gelê Kurd ve bi germî hate pêşwazîkirinê. Lê belê paşan me dit ku Peymana Qamişlo nehat ci be ci kirinê û halwesta** rêxistinên **siyasî yên Kurdistana Rojava derheqa pirsên girîng yên Suriyê cuda cuda bûn, ku ev yêka dihilbijartina Suriyê da xwe eşkere kir. Paş Peymana Hewlêr-1 û Hewlêr-2 û Peymana Dihokê, Peymana Qamişlo jî li ser kaxizê man. Gelo çima? Bir û baweriya te li ser vê babetê çiye?

Em wek Partiya Pêşverû dibînin ku rêkeftina ku bi navê Rêkeftina Qamişlo yan Konfiransê 26 Nîsana 2005 hatiye binav kirin helwesta yekgirtî ji Kurdan re li Sûriyê derbirand. Cara yekem bû belgeyek hat pejirandın, ku têde nerîna xwe di derbarê pêşeroja Sûriyê di ava kirina rejîmeke demoqrat û ne navendî û herwiha di derbarê mafên Kurdan de li Sûriyê bi venasîneke makezagonî bi hebûna neteweya Kurd î û çespandina venasîna zimanê Kurdî wek zimanekî fermî di welêt de. Herwiha tekezî li ser taybetmendiya herêmên Kurdî di rêvebirina wê de û hevpariyek rastîn li navendê de. Di vî konfiransê da

Rûpel 16

Hişmend Şêxo : Di bîranîna pakrewanbûna Diktor Ebdilrihman Qasimlo de

(Diktor Qasimlo mamosteyê gelê xwe)

Diktor Ebdilrehman Qasimlo di sala (1930) de li bajarê Ormiyê li Kurdistana Îranê hatiye dunyayê , xwendina xwe ya seretayî û navîn li Ormiyê û Tehranê xwendiye , û piştre di sala (1948an) de çûye bajarê Istenbûlê da ku xwendina xwe ya Zanîngehê tewaw bike , piştre biryar stand ku xwendina xwe li Ewrupa tewaw bike.
Dema ku ew li Istenbûlê wî nivîskar û rojnamevan "Mûse Enter" û xwendekarên kurd ên welatparêz naskirin , piştre çû Ewrupa ji bo tewaw kirina xwendina xwe.
Qasimlo li Firansa û piştre li Tişîkoslofakiya zanistên rêzanî û civakî xwend lê qet ji êş û azara gelê xwe bidûr neket.
Qasimlo biryar da ku tevlî rikberiya demoqrat bibe ya ku li dijî impiryaliya Îranê bi pêş ket.
Di sala (1952an) de ew vegeriya welêt daku di xebata demoqrat de beşdar bibe û Qasimlo pênc salan karê rêzanî bi şêweyên neyênî û aşkere dikir û hêdî hêdî Qasimlo weke kasayetiyekî rêzanî û xwedî bandor di nav gelê kurd û rikberiya îranî de hate nasîn.
Diktor Ebdilrihman Qasimlo waneyên destemayî û aboriya Sosyalîst li Zanîngeha Biragê didan , û ta sala (1961) waneyên zimên û çanda kurdî li Zanîngeha Sorbonê li Parîsê didan , herwiha xwedî rolekî girîng bû di avakirina Yekîtî ya Ciwanên Demoqrat li Kurdistanê ku yek ji saziyên Partî Demoqratî Kurdistanî Îran bû , û piştî demeke kurt bi fermî bû endamê vê partiyê û di hemû desteyên partîzanî de kar kir daku bû emîndarê giştî ji Partiya Demoqrat a Kurdistana Îranê re.
Diktor Ebdilrihman Qasimlo kasayetiyekî bîrbir û hişmend bû , lewre wî û hevalên xwe yên partîzan bi hûrbînî rewşa rêzanî û aborî ya Îranê xwendin , herwiha rewşa çepên Îranê û tevgera niştimanî ya kurdî li gor peywendiyên wî wek emîndarê giştî bi Yekîtiya Sovyêt re , û istratîjiya demoqratî ji Îranê re û otûnomî ji Kurdistanê re bi rêket , û kongireya Sêyem a partiyê van pêşinyarên Diktor erê kirin û ew pêşinyar bûn istratîjiya fermî ya Partiya Demoqrat û di wî kongirî de ew hate hilbijartin wek emîndarê giştî ji Partiya Demoqrat a Kurdistan a Îranê re , û bû yek ji wan kesayetiyên rêzanî yên girîng di hemû parçeyên Kurdistanê de.
Hêjayî gotinê ku di sala (1978an)de Diktor Ebdilrihman Qasimlo bi hevaltiya Bîst Hezar şervan ji hêzên pêşmergeyên dilêr operesiyoneke berfireh li dijî artêşa sahê Îranê rabûn û pêşmerge dest danîn ser bajar û bajarokên Kurdistana Îranê û wisa gelê kurd kevirê bingehîn ji avakirina dewleteke demoqrat re danîn.
Di dîroka / 13 / 8 / 1989an de Diktor Ebdilrihman Qasimlo ji bo mafê otûnomî ji Kurdistana Îranê re danûstandin bi rayedarên Îranî re dikirin lê zor mixabin di wan danûstandinan de ew ji aliyê istixbaratên "Savak" li bajarê Viyêna li paytexta Nemsa hate kuştin û di goristana pakrewanên şoreşê de li Parîsê hate binax kirin.

Sed silav li giyanê te ey xebatkarê dilsoz û dilêr

13 / 7 / 2026 Z - 2638 K

***Endamê Komîta Navendî ya**
Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê

Dûmahiya Dengê Pêşerû

hepeymana navdewletî ya li dijî tîrorê li Sûriya, hemî li vî konferansî beşdar û amade bûn. Di encam de konferans bi yek nerîna siyasî ya hevbeş ji bo çareser kirina pirsa Kurdî û ya nîştimanî li Sûriya, bi dawî hat, û yek şanda Kurdî jî hate destnîşan kirin ku bi navê Tevgera Kurdî li Sûriya danûstandinê bike bi hikûmeta demkî re li Şamê li ser bingeha wê nerîna hevbeş. Ev karê pîroz bû ciyê dilxweşiyê li cem miletê Kurd û dostên wî li her cihî.

Lê belê hin aliyên naskirî ji nav Tevger Kurdî li Sûriya, nikarîbûn xwe ji ezezîtî û ji nakokiyên xwe yên navxweyî rizgar bikin û li gor bercewendiyên xwe yên teng meşiyan, û bi tena xwe berê xwe dane Şamê. Hikûmeta demkî jî her ev tişt dixwest, lewma vê hikûmetê ew şandên yekalî bi germî pêşwazî kirin, bi armanca ku şanda Kurdî ya hevbeş pûç bike û hilweşîne û şêweyê danûstandinê li ser pirsa Kurdî bide guhertin û bi arasteyekî din ve bajoyê, ji ber ku ev pirs bi xwe pirseke netewî taybet e bi zêdetir ji 15% ji tevaya jimara xelkê Sûriya ye û pêwist e di destûra nû de were çareser kirin û destnîşan kirin û bi tenê vê pirsê wek pirseke îdarî bibîne û wê di çend postên hikûmî û perlemanî de kurt bike.

Û di dema ku hemiyan çavnêriya raya giştî ya Kurdî û Kurdistanî dikirin, ku li dijî van aliyan raweste û bisekine, û ji wan bixwaze ku pabendî derencamên konferansa yekhelwist û yekrêziya Kurdî bibin. Di vê demê bi xwe de hin deng hatin bilind kirin û bihîstin, çi li vir yan li wir, ku êrîşê dibine ser Tevge Kurdî li Sûriya bi tevayî û wê bi giştî gunehbar dikin û jê dixwazin ku xwe bi yekcarî hilweşîne, û doza li darxistina kongirekî dikin bi hêviya ku ji nûve wê li gor pîvanên bejn û bala xwe bidirûn û ava bikin.

Eger ew aliyên ku van daxwazên wîranker dikin werin naskirin û destnîşan kirin, wê eşkere bibe ku hin ji wan kesan yên ku têkçûne û di rêvebirina partiyên xwe de feşel anîne û di karê xwe de sernekeftine. Di seranserê bi dehan salên dawî de rola xwe lîstine, çi bi vî şêweyî yan bi şêweyên din, di hilweşandina rêzên Tevgera Kurdî de li Sûriya, û destekî wan yê dirêj hebû di pûç kirina şanda Kurdî ya hevbeş de û di beravêtî kirina derencamên konferansa yekhelwist û yekrêziya Kurdî de.

Li şûna ku ev kesên têkçûyî û faşil, werin gotina Şemşûnê Cebar dûbare bikin, ku dibêje: 'Li ser min û li ser dujminê min jî', û li şûna ku doza hilweşandina peykerê rêxistinî yê mayî ji laşê Tevgera Kurdî li Sûriya bikin, baştir ew e wan fedakariyên giranbuha yên bi sedan hezar xebatkar û têkoşeran pêşkêş kirine, di bîra xwe bînin, ku ewan hemî qurbanî dane û didin li dijî siyasetên rêjîmên şovînî û diktatorî. Her wiha pêwist e ew dilsozê pirsa xwe ya netewî bin, û karbikin wan astengiyan bidin alî û rakin ji pêşiya derencamên konferansê 26 nîsana 2025'an û rê xweş bikin li ber şanda Kurdî ku ta roja îro her ew nûneratiya rewa ye ya Tevgera Kurdî dike li Sûriya. Bi dirustî jî kar bikin ji bo çareser kirina pirsa Kurdî di destûra Sûrî ya nû de, wek pirseke netewî û ev yek nayê bi destxistin bi riya hilweşandina Tevgera Kurdî û herifandina wê, lê bi tenê bi riya ava kirina kesayetiya vê tevgerê, û parastina biryara wê ya siyasî ya ser bixwe û xwedî derketin li taybetmendiyên wê yên netewî.

Bi giyan û vîna Rojnameya Kurdistan Em xebata xwe dikin

Bi helkefta cejna Rojnamegeriya Kurdî Desteya sernivîser a Rojnameya Pêşverû cejna hemû Rojname , Kovar , Tv , Malperên Eliktironî û cejna tevahî medyekar û rojnamevanên Kurdistanê pîroz dike û serkeftinê ji xebata Rojnamegeriya Kurdî re dixwaze.

Pêşverû
Siyasî . Çandî . Giştî

Desteya sernivîser a Rojnameya Pêşverû

Rojnameya Pêşverû Dengê miletê kurd e
Dengê Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê ye

Pêşverû

Siyasî . Çandî . Giştî

Rojnameyeke Mehaneye ji Aliyê Nivîsgeha Ragahandina Efrînê ya Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê Tê weşandin Hejmar(102-103) *Tebax 2026 Z - 2638 K*

Dengê Pêşverû

Tevgera Kurdî li Sûriyê Divê Were Parastin, Ne Hilweşandin

Tevgera Kurdî li Sûriyê, ji destpêka damezrandina xwe ve, yanî ji sala 1957 ve, rastî gelek êrîşên dijwar hatiye ku li dijî siyaset û armancên wê hatine kirin. Her wiha gelek hewildan jî hatine kirin ji bo kêmkirin û daxistina moralê kadir û têkoşerên wê, çi ji nav rêzên Tevgera Kurdî bi xwe ve, yan ji aliyê desthilatên şovînî yên ku hemî awayên zordestî û serkut kirin û îstibdadê, li dijî vê tevgerê bikar anîne. Tevî van astengiyan jî lê Tevgera Kurdî her xebata xwe berdewam kiriye di navbera çakûçê siyasetên şovînî yên dijwar û sindana aliyên Kurdî yên xweperest de. Bê guman, Tevgera Kurdî li Sûriya, di seranserê xebata xwe ya dûr û dirêj de, di rewşeke gelekî dijwar û awarte re derbas bûye û pêwestiya wê bi lêvegereke rexneyê ya avaker heye, ji bo rastkirina şaşiyên wê yên ku hene û xurtkirina rola wê, bi awayekî ku li gorî astê van guhertinên kûr û pêşveçûnên li dûv hev be, ku welat ji 15 salan ve têre derbas dibe. Vê kirîza Sûrî perde ji ser şaşî û kêmasiyên Tevgera Kurdî daye alî û xalên qelsî û lawaziya wê eşkere kirine. Nexasim piştî herifandina rêjîma BAAS û bi destxistina desthilatê ji aliyê rêxistina HTŞ û rêvebirina welat bi takrewî, û sepandina yek rengî li ser dezgeh û saziyên demkî, û piştguhxistina pêkhatiyên netewî û olî, nexasim pêkhatiya Kurdî, ku ew diwem mezintirin pêkhateya netewî ye li Sûriya û dûrxistina wan ji beşdariya rasteqîne di avakirina Sûriya nû de. Evê rewşa wêranker û dijwar, Tevgera Kurdî li Sûriya neçar kir ku mil bide ber zext û fişara raya giştî ya Kurdî û Kurdistanî û navdewletî. Yekem car di dîroka xwe de koniferansê xwe yê berfireh li bajarê Qamişlo di 26 nîsana 2025'de, li darbixe, di jêr navnîşana Konferansê Yekhelwist û Yekrêziya Kurdî de, ku nûnerên partiyên siyasî û saziyên rewşenbîrî û civakî yên Kurdî, herwiha nûnerên hêzên Kurdistanî yên serekî, û ***nûnerê***

Rûpel 19

Karwanê dawiyê gihan navenda bajarê Efrînê

Ey gelê dilsoz û cefakêş em pîrozbahiya we dikin û dibêjin: Hûn bi xêr vegeriyan bajarê xwe

Desteya sernivîser a Rojnameya Pêşverû

Bendava Meydankê we silav dike

Rojnameya Pêşverû

Ev Rojname Rojnameya we ye
Ev Deng û Hawara we ye
Zengîn bikin bi gotarên xwe
Ev xewn û Hêviya me ye

Hişmend

E.Mail: altekedome-efrin@hotmail.com Facebook التقدمي عفرين